



Wêne: Rûdaw

Tora navnetewî ya akademîsyenên kurd Kurdish Studies Network

Zeydanlioglu: Em akademîsyenên kurd bi hev û bi dinyayê didin nasîn

Ergülen Toprak / New York

Aka demîsyenên kurd ên ku li zanîngeh û dezgehên Ewropa, Amerîka, Tirkîye, Kurdistan û Rojhilata Navîn xebatên akademîk dikin, li ser înternetê platforma bi navê Kurdish Studies Network (Tora Lêkolînên Kurdî - KSN) avakirin. Ji çendîn welatên cihanê nêzîka 800 endamên torê her roj xebatên xwe bi zimanê îngilîzî parve dikin. Akademîsyenên kurd pirranî derbarê pirsgrêka Kurdan, çand, partî û dezgehên Kurdan de nêrînen xwe parve dikin û hinek jî ji bo karên xwe li çavkanî û têkiliyan digerin. Welat Zeydanlioglu di sala 2009ê de, piştî konferansa ku ji aliyê Navenda Xebatên Kurd li Zanîngeha Exeter hat lidarxistin, ev tor li Brîtanîyayê ava kir.

Rûdaw: Ramana avakirina Kurdish Studies Network çawa çêbû?

Welat Zeydanlioglu: Dema min ji bo amadekariya doktoraya xwe derbarê pirsgrêka Kurdan de lêkolîn kirin, min dît ku mirovên weke min çiqas bi tenê dimînin û çavkanî çiqas kêmtir in. Lê ji bo mijar û ji bo xwendekar û akademîsyenên din gellek fakûlteyên taybet, departman, mamosteyên pispor, hevalbendên bi ezmûn, konferans, atolyeyên xebatê û kovarên taybet hene. Lê ji bo lêkolînên Kurdan hema bêje heta çend sal berê ti çavkanî û derfetek tine bû. Tenê çend akademîsyenên ku derbarê pirsgrêka Kurdan de kar dikin hebûn û hejmareke hindik pirtûk, kovar û gotar hebûn. Di nava deh salên dawî de hinek pêşketin çêbûn, hejmara kesên û akademîsyenên zêde bû. Lê em dîsa nikarin rikberiya Palestinian Studies anjî Turkish Studies bikin. Ji ber vê rewşê û pêdiviyên ku min anîn ziman, me sala 2009ê ev tor ava kir.

Niha çend endamên we hene?

Tora me ji grûba e-mailê pêk tê û di grûbê de nêzîka 800 endam hene. Ango bi e-mailekî em dikarin derbarê mijareke girêdayî Kurdan de xwe bigihînin akademîsyenên li cihê herî dûr li ser rûyê dinyayê. Di Facebookê de jî forûmek me heye û 625 kes tê de hene. Ji bilî wê malpera me heye: <http://kurdishstudiesnetwork.wordpress.com/>

Profila endamên we çawa ye?

Pirraniya endamên me derbarê Kurdan de lêkolîn û karên taybet dikin. Ji xwendevanên masterê bigirin, heta akademîsyenên navdar gellek kes hene. Martin van Bruinessen, Hamit Bozarslan, Mesut Yegen, Amir Hassanpour û Abbas Valî çend navên naskirî ne. Herwiha rojnamevan, aktîvîst, siyasetmedar û kesên ku li ser Kurdan xebatê dikin...

Bi pirranî li ser kîjan mijaran agahî û peyam tînin parvekirin?

Carinan pirr zêde agahî tînin parvekirin, lê roj heye ku ti agahî nayê parvekirin. Bêhtir derbarê

dibin ka kî derbarê kîjan mijarê de lêkolîn dîke, pêdiviya kê bi kîjan çavkanîyê heye, kengî û li kû konferans û panel tînin lidarxistin û hwd. Ev tişt dînamîzma me zêde dîke û dibe sedema kar û projeyên nû.



Ji bo pêşerojê çî projeyên KSNê hene?

Kêmasiya herî mezin nebûna kovareke îngilîzî ya navnetewî bû. Ji ber enerjîya ku me ji xebatên xwe wergirt, di destpêka 2013ê de me bi navê Kurdish Studies dest bi amadekariya kovareke zanistî kir. Kovar wê li gor standardên navnetewî be. Hejmara yekem di Cotmehê de tê weşandin. Wê hem online be û hem jî çapkirî. Linka kovarê jî ev e: <http://www.kurdishstudies.net>

Kampanyaya we ya ji bo grevên birçîbûnê pirr deng da...

Belê, kampanyaya me ya herî mezin bû ew. Me pêwendî û têkiliyên xwe bikaranîn û îmze ji kesên wek Noam Chomsky û Judith Butler stand. Ev kar ji nişka ve destpêkir û paşê berfireh bû, zêdeyî 500 îmze hatin civandin.

Min dît ku mirovên weke min çiqas bi tenê dimînin û çavkanî çiqas kêmtir in.

lêkolînên akademîk, gotar, pirtûk, kampanyayên îmzeyan, bangên çalakîyan, konferans û panelan parvekirin çêdibin. Em agahdar

Welat Zeydanlioglu kî ye?

Li navçeya Bedlîsê Tetwanê hatiye dinyayê û li Swêdê mezin bûye. Perwerdeya xwe ya bilind li Brîtanîyayê berdeyam kir û teza xwe ya doktorayê li ser mijara "Di avakirina neteweyê nû de têkiliya Kemalîzmê bi Oryantalîzmê re" nivîsand. Di dema nivîsandina doktoraya xwe de lêkolîn derbarê bandora Kemalîzmê li ser pirsgrêka Kurdan kir. Koordînatîriya KSN û edîtorîya Kurdish Studies dike. Di çendîn kovarên navnetewî de derbarê Tirkîyeyê û pirsgrêka Kurdan de gotarên wî hatine weşandin.

Kî ne akademîsyenên kurd?

Di bin tîgeha "akademîsyenên kurd" de pirr kes û ezmûnên cuda hene, angogrûbeke homojen tine ye. Lê jixwe armanca torê danasîna wan e û çêkirina pêwendîyan e di navbera wan de, daku karibin karên kolektîf bihev re bikin.

Bêhtir ji kîjan beşê Kurdistanê endamên we hene?

Bi pirranî ji Tirkîyeyê û Bakurê Kurdistanê hene. Çi Kurd, çi Tirk, nişkekî nû heye ku bala xwe didin pirsgrêka Kurdan û weke mijareke lêkolînê lê dinêrin. Wekî din ji Ewropayê jî endam hene.

Hûn lêkolînên akademîk li Başûrê Kurdistanê çawa dibînin?

Başûrê Kurdistanê di pêvajoyê geşbûn û pêşketinê de derbas dibe, sazî û dezgehên xwe ava dike, ewên heyî jî xurttir dike. Herwiha gellek zanîngehên nû hatin damezrandin. Lê mixabin kêmasî di kalîteya perwerdeyê de û di rêjeya zanistîya naveroka wê de heye û perwerde li

jêr standardên navnetewî de ye. Li gellek zanîngehan ders ji aliyê xwendevanên masterê ve tînin dayîn. Hewldanên hikûmeta Herêma Kurdistanê jî hene ji bo bilindkirina kalîteya perwerdeyê, lê divê bêhtir derfet hebin ji bo zêdekirina hejmara xwendevanên master û doktorayê, herwiha bo pêwendîya bi zanîngehên cihanê re û veguhastina xwendevanên di navbera zanîngehan de. Ji bo vê mijarê sala borî konferansek li Hewlêrê hat lidarxistin. Mînak, îngilîziya xwendevanên pirr kêmtir e. Divê herî kêmtir zanîngeheke navdar a Rojhilata Navîn li herêma Kurdistanê be.

Tevlîbûn ji Herêma Kurdistanê bo networka we çawa ye?

Belê, di demên dawî de hinek endam ji Herêma Kurdistanê tevî me bûn. Em hewl didin ku bi rêya networkê ji ezmûnên navnetewî sîd werbigirin, pêwendî bi akademîsyenên cihanî re deynin û ji bo Kurdistanê bibin hevî. Eger derfet hebe, em hewl didin kovara Kurdish Studies ji bo Herêma Kurdistanê weke open access vekin. Herwiha em hewl didin di navbera akademîsyenên kurd de ji her çar perçeyan karên hevbeş destpê bikin.

Parêzer Uzun Buroya Parêzeriyê

Em li seranserê Almaniyayê di xizmeta we de ne

Beşên me yê kar

Dadweriya Kar (Arbeitsrecht)
Dadweriya Aborî (Wirtschaftsrecht)
Dadweriya Trafîkê (Verkehrsrecht)
Dadweriya Werzişê (Sportrecht)
Dadweriya Peymanê (Vertragsrecht)
Dadweriya (Arzt Haftungsrecht)
berpirsiyariya pizîşkî

Parêzer Oktay Uzun

Navnîşan:
Sonnemannstr. 3
60314 Frankfurt am Main

Tel.: 069 - 49 600 87
Fax: 069 - 49 600 88
email: info@kanzlei-uzun.de
web: www.kanzlei-uzun.de

Taha & Yassien

أليف لخدمات دفن الموتى
مساعدات فورية في حالة الوفيات

Em cenazeyan ji Almaniyayê dişînin hemu cihan û herçar beşên Kurdistanê
الإيصال حتى الوطن / الرعاية والإمشارة

Sonnenallee 101 030 569 769 45
12045 Berlin 0179 675 40 21 Kurdî
saban.citlak@gmx.de 0176 59 95 55 00 Arabî
0176 215 111.73 Türkçe FAX: 030 287 084 05



BERTAX - CONSULTANT

Unternehmensberatungsgesellschaft mbH



Mihasebeya we
di destên ewle de!

Mihasebeya Malî
Finanzbuchhaltung
Mihasebeya Karkeran
Lohnbuchhaltung

Office-Essen
Zeche Katharina 2
45307 Essen
Tel.: 0201/8933950
Fax: 0201/8933951
Mobil: 0177/3147213
E-Mail:
info@bertax-consultant.de

Office-Dortmund
Geschwister-
Scholl-Str. 26
44135 Dortmund
Tel.: 0231/15044-510
Fax: 0231/15044-115